# К’ьтеба Уньс

## Пешготьн

Әв к’ьтеб бона мәрьвәки гьли дькә, йе кö хwәст жь т’әмийа Хöданә wир’а дайи бьр’әвә. Сәрhатийа ве к’ьтебе qöр’на 8-да бәри буйина Иса qәwьмийә. Хwәде т’әми ль Уньс кьр wәки хәбәра wи бьналийед Нинәwайер’а даннасин кә, Нинәwайе п’айт’әхте императорийа Ашурийайә позбьльнд бу. Ле Уньс нәхwәст кö hәр’ә, wәки бьналийед Нинәwайә дьжмьнед Исраел, жь гöнед хwә вәгәр’ьн у р’ә’ма Хöдан нәстиньн. Бь ви аwайи Уньс жь Хwәде р’әви у хwәст кö жь Нинәwайе дур к’әвә. Пәй чәнд qәwьмандьнар’а Уньс гöр’а Хwәде кьр, ле hерс к’әт гава Хwәде бьналийед Нинәwайе hатә р’ә’ме. Бона ве кьра хwәйә нәр’аст Хwәде

© Înstîtûta Welger'andina K'itêba Pîroz, Moskva, 2009

# K'itêba Ûnis

## Pêşgotin

Ev k'itêb bona merivekî gilî dike, yê ku xwest ji t'emîya Xudane wîr'a dayî bir'eve. Serhatîya vê k'itêbê qur'na 8-da berî bûyîna Îsa qewimîye. Xwedê t'emî li Ûnis kir wekî xebera wî binalîyêd Nînewayêr'a dannasîn ke, Nînewayê p'ayt'extê împêratorîya Aşûrîyaye pozbilind bû. Lê Ûnis nexwest ku her'e, wekî binalîyêd Nînewaye dijminêd Îsraêl, ji gunêd xwe veger'in û r'e'ma Xudan nestînin. Bi vî awayî Ûnis ji Xwedê r'evî û xwest ku ji Nînewayê dûr k'eve. Pey çend qewimandinar'a Ûnis gur'a Xwedê kir, lê hêrs k'et gava Xwedê binalîyêd Nînewayê hate r'e'mê. Bona vê kira xweye ner'ast Xwedê

Уньс һьлат. [2] Ве сәрһатиеда чәнд сурәтед Хwә-
дейә сәрәкә тенә нишанкьрьне. Уньс әw сурәте
мьләте щьһуйа йә, кӧ дьфькьрьн wәки мьләтед
башqә нәһежайи хьлазкьрьна Хwәде нә. Ле Хwә-
де т'әне щьһуйа һ'ьз накә, әw ӧса жи р'ә'ме ль
wан мьләтед майин дькә, к'ижан кӧ wи qәбул дь-
кьн. Һәгәр мьләтәк һьлатьна Хwәде дьбьһе у жь
кьред хwәйә хьраб вәдьгәр'ә, һьнге Хwәде һерса
хwә ль wи р'анакә. Хwәде һ'ӧкӧми сәр мьрьн у
жийина ә'фьринед хwә дькә, ләма һәгәр әw бь-
хwазә бьбахшинә йәки, мәрьвәки дьн изьна wи
т'ӧнә ль сәр ве йәке һерса хwә р'акә. [3] Пәймана
Нуда Иса жи бона сәрһатийа Уньс дьбежә, кӧ бо-
на мьрьн у qийамәтийа хwә ә'йан кә. Ӧса жи Иса
гӧһдарванед хwәр'а бона вәгәр'андьна бьнали-
йед Нинәwайе дьбежә (Мәтта 12:38-41; Марqос
8:11-12; Луqа 11:29-32).

## 1

*Уньс гӧр'а Хӧдан накә*

[1] Хәбәра Хӧдан Уньсе кӧр'е Амиттайр'а һат у гот:
[2] «Р'абә һәр'ә бажаре Нинәwайа мәзьн даннасин кә
у wе щьмә'те һьле, чьмки нәһәqийед wан гьһиш-
тьнә ль бәр п'әр'е ә'змен». [3] Ле Уньс р'абу кӧ жь
бәр ч'ә'ве Хӧдан бьр'әвә Т'аршише. Әw бәр'жери

Ûnis hilat. 2 Vê serhatîyêda çend sûretêd Xwedêye
sereke têne nîşankirinê. Ûnis ew sûretê miletê ci-
hûya ye, ku difikirin wekî miletêd başqe nehêjayî
xilazkirina Xwedê ne. Lê Xwedê t'enê cihûya h'iz
nake, ew usa jî r'e'mê li wan miletêd mayîn dike,
k'îjan ku wî qebûl dikin. Heger miletek hilatina
Xwedê dibihê û ji kirêd xweye xirab vediger'e,
hingê Xwedê hêrsa xwe li wî r'anake. Xwedê h'u-
kumî ser mirin û jîyîna e'firînêd xwe dike, lema
heger ew bixwaze bibaxşîne yekî, merivekî din
îzina wî t'une li ser vê yekê hêrsa xwe r'ake.
3 Peymana Nûda Îsa jî bona serhatîya Ûnis dibêje,
ku bona mirin û qîyametîya xwe e'yan ke. Usa jî
Îsa guhdarvanêd xwer'a bona veger'andina binalî-
yêd Nînewayê dibêje (Metta 12:38-41; Marqos
8:11-12; Lûqa 11:29-32).

# 1

## *Ûnis gur'a Xudan nake*

1 Xebera Xudan Ûnisê kur'ê Amîttayr'a hat û
got: 2 «R'abe her'e bajarê Nînewaya mezin danna-
sîn ke û wê cime'tê hilê, çimkî neheqîyêd wan
gihîştine li ber p'er'ê e'zmên». 3 Lê Ûnis r'abû ku
ji ber ç'e'vê Xudan bir'eve T'arşîşê. Ew ber'jêrî

Йафайе бу, гәмик дит кӧ дьчу Т’аршише, әwи һә-
qе р’ийа хwә дайе, к’әтә гәмийе кӧ т’әви wан һәр’ә
Т’аршише, wәки жь дәсте Хӧдан бьр’әвә.
4 Ле Хӧдан баки qайим ль бә’ре р’акьр у бә’ре-
да фьртонәкә мәзьн р’абу, әw бу кӧ гәми һурдәх-
wәши буйа. 5 Һьнге гәмиван тьрсийан у һәр мә-
рьвәки һәwара хwә хwәдейе хwә ани у әw дәрда-
нед кӧ гәмийеда һәбун авитьнә бә’ре, wәки баре
гәмийе сьвьк кьн. Ле Уньс чубу к’әтьбу лап бьне
гәмийе, п’алдабу у к’әтьбу хәwа к’ур.
6 Сәрwере гәмийе һатә щәм Уньс у готе: «Әв чь
хәwт’ешә к’әтийә ч’ә’ве тә? Һәла р’абә гази хwәде
хwә кә! Бәлки хwәде тә мә бир бинә у әм ӧнда
нәбьн». 7 Һьнге готьнә һәв: «Wәрьн әм п’әшк баве-
жьн к’а әва qәзийа р’уйе жь мә к’ижанида һатийә
ль сәре мә» у п’әшк авитьн, п’әшк п’ара Уньс к’әт.
8 Һьнге готьнә Уньс: «Дә ньһа мәр’а бежә, р’уйе
к’еда әва qәзийа һатийә ль сәре мә? Тӧ хwәйе чь
шьхӧли йи? Тӧ жь к’ӧ те йи? Жь к’ижан wәлати
йи у жь чь мьләти йи?» 9 Ле әwи ль wан вәгәр’анд
у гот: «Әз Ибрани мә. Жь Хӧдан Хwәдейе ә’змен,
ә’фьрандаре бә’р у бәже хоф дькьм». 10 Һьнге хоф
к’әтә ль сәр wан у готьнә wи: «Тә чьма әв йәк кь-
рийә?» Чьмки әw мәрьвана пе һ’әсийабун кӧ әва
жь дәсте Хӧдан дьр’әвә, пешда әwи wанар’а гьли
кьрьбу. 11 Паше готьне: «Ньһа әм тә чаwа бькьн,

Yafayê bû, gemîk dît ku diçû T'arşîşê, ewî heqê r'îya
xwe dayê, k'ete gemîyê ku t'evî wan her'e T'arşîşê,
wekî ji destê Xudan bir'eve.
4 Lê Xudan bakî qayîm li be'rê r'akir û be'rêda fir-
toneke mezin r'abû, ew bû ku gemî hûrdexweşî bû-
ya. 5 Hingê gemîvan tirsîyan û her merivekî hewara
xwe xwedêyê xwe anî û ew derdanêd ku gemîyêda
hebûn avîtine be'rê, wekî barê gemîyê sivik kin. Lê
Ûnis çûbû k'etibû lap binê gemîyê, p'aldabû û k'eti-
bû xewa k'ûr.
6 Serwêrê gemîyê hate cem Ûnis û gotê: «Ev çi
xewt'êşe k'etîye ç'e'vê te? Hela r'abe gazî xwedê
xwe ke! Belkî xwedê te me bîr bîne û em unda ne-
bin». 7 Hingê gotine hev: «Werin em p'eşk bavêjin
k'a eva qezîya r'ûyê ji me k'îjanîda hatîye li serê
me» û p'eşk avîtin, p'eşk p'ara Ûnis k'et. 8 Hingê go-
tine Ûnis: «De niha mer'a bêje, r'ûyê k'êda eva qezî-
ya hatîye li serê me? Tu xweyê çi şixulî yî? Tu ji k'u
tê yî? Ji k'îjan welatî yî û ji çi miletî yî?» 9 Lê ewî li
wan veger'and û got: «Ez Îbranî me. Ji Xudan Xwe-
dêyê e'zmên, e'firandarê be'r û bejê xof dikim».
10 Hingê xof k'ete li ser wan û gotine wî: «Te çima
ev yek kirîye?» Çimkî ew merivana pê h'esîyabûn
ku eva ji destê Xudan dir'eve, pêşda ewî wanar'a
gilî kiribû. 11 Paşê gotinê: «Niha em te çawa bikin,

wəки бə’р ль мə вəгəр’ə бьсəqьр’ə?» Чьмки чьqас
дьчу пелед бə’ре һе р’адьбун. 12 Һьнге Уньс готə
wан: «Мьн һьлдьн бавежьнə бə’ре у бə’ре ль wə
вəгəр’ə бьсəqьр’ə, чьмки əз заньм кö р’уйе мьнда
əва йəка һатийə ль сəре wə».

13 Wан мəрьва һе бер дьк’ьшандьн, дькьрьн кö
хwə ль бəже бьгьрьн, ле жь qəwата wан дəр бу,
чьмки пелед бə’ре чьqас дьчу һе ль wан р’адьбун.
14 Һьнге wана һəwара хwə Хöдан ани у готьн: «Йа
Хöдан, əм р’əща жь тə дькьн, нə бə кö ль р’уйе
ви мəрьвида əм öнда бьн у хуна ви ль щийе һə-
qи-нəһəq ль сəр мəда нəйнə, чьмки тə Хöдан,
wəкə qьрара хwə кьр». 15 У Уньс һьлдан авитьнə
бə’ре у бə’р жь wе т’əвр’абуна хwə сəqьр’и. 16 Əw
мəрьвана жь Хöдан гəлəки тьрсийан, qöрбан Хwə-
дер’а дан у ад-qьрар кьрьн.

## 2

*Дöа Уньс*

1 Һьнге Хöдан ə’мьри ль сəр һ’утəки кьр кö
Уньс даqöртинə у Уньс се р’ож у се шəва зьке
һ’утда ма. 2 Пəй ве йəкер’а Уньс зьке һ’утда гази
Хöдан Хwəде хwə кьр. 3 У гот:

«Мьн тəнгасийа хwəда гази Хöдан кьр
у wи щаба мьн да,

wekî be’r li me veger’e biseqir’e?» Çimkî çiqas diçû
pêlêd be’rê hê r’adibûn. 12 Hingê Ûnis gote wan:
«Min hildin bavêjine be’rê û be’rê li we veger’e bi-
seqir’e, çimkî ez zanim ku r’ûyê minda eva yeka
hatîye li serê we».

13 Wan meriva hê bêr dik’işandin, dikirin ku
xwe li bejê bigirin, lê ji qewata wan der bû, çimkî
pêlêd be’rê çiqas diçû hê li wan r’adibûn. 14 Hin-
gê wana hewara xwe Xudan anî û gotin: «Ya Xu-
dan, em r’eca ji te dikin, ne be ku li r’ûyê vî meri-
vîda em unda bin û xûna vî li cîyê heqî-neheq li
ser meda neyne, çimkî te Xudan, weke qirara
xwe kir». 15 Û Ûnis hildan avîtine be’rê û be’r ji
wê t’evr’abûna xwe seqir’î. 16 Ew merivana ji Xu-
dan gelekî tirsîyan, qurban Xwedêr’a dan û
ad-qirar kirin.

## 2

### *Dua Ûnis*

1 Hingê Xudan e’mirî li ser h’ûtekî kir ku Ûnis
daqurtîne û Ûnis sê r’oj û sê şeva zikê h’ûtda ma.
2 Pey vê yekêr’a Ûnis zikê h’ûtda gazî Xudan Xwe-
dê xwe kir. 3 Û got:

«Min tengasîya xweda gazî Xudan kir
û wî caba min da,

жь зьке дийаре мьрийада һәwар кьр
у тә дәнге мьн бьһист.
4 Тә әз авитьмә нав дьле к’урайийа бә’ре
у һ’әжед ава әз ньхамтьм,
һ’әму авед тә пелед wанва ль сәр мьнр’а чун.
5 Һьнге мьн гот: ‹Әз жь бәр ч’ә’вед тә һатьмә
авитьне,
ле бәле әзе диса бьбиньм п’арьстгәһа
тәйә пироз›.
6 Ава әз мьна кьрьм у бин ль мьн дьч’ькийа,
к’урайийа бә’ре әз ньхамтьм
у гиһайе бә’ре ль сәре мьн п’еч’ийа.
7 Һ’әта р’ьк’ьне ч’ийа әз чумә харе,
ә’рде чаwа ахьле һ’әта-һ’әтайе дора мьн
гьртьбу.
Ле те ә’мьре мьн жь гор’ьстен дәрхи,
Хӧдан Хwәдейе мьн.
8 Гава әз к’әтьмә ль бәр р’ӧһ’,
Хӧдан мьн тӧ бир ани
у дӧайе мьн гьһиштә п’арьстгәһа тәйә
пироз.
9 Әwед кӧ пәй тьштед п’уч’ә дәрәw дьк’әвьн,
әw дәст жь йе хwәйи р’ә’м у к’әрәм
дьк’ьшиньн.
10 Ле әзе бь дәнге шькьрдарийе qӧрбане
тәр’а бьдьм

ji zikê dîyarê mirîyada hewar kir
û te dengê min bihîst.
4 Te ez avîtime nav dilê k'ûrayîya be'rê
û h'ejêd ava ez nixamtim,
h'emû avêd te pêlêd wanva li ser minr'a çûn.
5 Hingê min got: ‹Ez ji ber ç'e'vêd te hatime
avîtinê,
lê belê ezê dîsa bibînim p'aristgeha
teye pîroz›.
6 Ava ez mina kirim û bîn li min diç'ikîya,
k'ûrayîya be'rê ez nixamtim
û gîhayê be'rê li serê min p'êç'îya.
7 H'eta r'ik'inê ç'îya ez çûme xarê,
e'rdê çawa axilê h'eta-h'etayê dora min
girtibû.
Lê tê e'mirê min ji gor'istên derxî,
Xudan Xwedêyê min.
8 Gava ez k'etime li ber r'uh',
Xudan min tu bîr anî
û duayê min gihîşte p'aristgeha teye
pîroz.
9 Ewêd ku pey tiştêd p'ûç'e derew dik'evin,
ew dest ji yê xweyî r'e'm û k'erem
dik'işînin.
10 Lê ezê bi dengê şikirdarîyê qurbanê
ter'a bidim

у чь мьн соз дайә жи әзе биньмә сери.
Хьлазбун т’әне жь дәсте Хӧдан ә».
[11] У һьнге Хӧдан ә’мьр ль һ’ут кьр, һ’ут кьрә һо-
qин Уньс авитә бәже.

## 3

*Уньс гӧр’а Хӧдан дькә*

[1] Хәбәра Хӧдан щара дӧда Уньср’а һат у гот:
[2] «Р’абә һәр’ә бажаре Нинәwайа мәзьн wе йәке нава
wеда даннасин кә, чь кӧ әз тәр’а дьбежьм». [3] Һьн-
ге Уньс ль гора готьна Хӧдан р’абу чу Нинәwайе.
Нинәwа жи бажарәки беһ’әсаб мәзьн бу, мьск’әне
wе wәкә р’ийа се р’ожа бу. [4] Уньс р’абу к’әтә ба-
жер, р’ийа р’ожәке qәданд, даннасин дькр у дь-
гот: «Һәла һе чьл р’ож һәйә, кӧ Нинәwа wеран бә».
[5] Бьналийед Нинәwайе баwәрийа хwә Хwәде
анин, qьрар кьрьн кӧ р’ожи бьгьрьн у жь ч’ука
һ’әта мәзьна к’ӧрх ль хwә кьрьн.
[6] Гава әв дәнг к’әтә гӧһе п’адше Нинәwайе, әw
жь сәр т’әхте хwә р’абу у чӧхе ль сәр хwә ехьст,
к’ӧрх ль хwә кьр у ль нава к’озийеда р’уньшт.
[7] Нав Нинәwайеда дәнг да бәлакьрьне у гот: «Анә-
гори готьна п’адше у гьрәгьра, бьра мәрьв у һ’әй-
wан, пәз у дәwар т’ӧ тьшти тә’м нәкьн, нәч’ерьн
нә жи вәхwьн. [8] Бьра мәрьв у һ’әйwан к’ӧрх ль

û çi min soz daye jî ezê bînime sêrî.
Xilazbûn t'enê ji destê Xudan e».

11 Û hingê Xudan e'mir li h'ût kir, h'ût kire hoqîn
Ûnis avîte bejê.

## 3

*Ûnis gur'a Xudan dike*

1 Xebera Xudan cara duda Ûnisr'a hat û got:
2 «R'abe her'e bajarê Nînewaya mezin wê yekê na-
va wêda dannasîn ke, çi ku ez ter'a dibêjim». 3 Hin-
gê Ûnis li gora gotina Xudan r'abû çû Nînewayê.
Nînewa jî bajarekî bêh'esab mezin bû, misk'enê
wê weke r'îya sê r'oja bû. 4 Ûnis r'abû k'ete bajêr,
r'îya r'ojekê qedand, dannasîn dikir û digot: «Hela
hê çil r'oj heye, ku Nînewa wêran be».

5 Binalîyêd Nînewayê bawerîya xwe Xwedê anîn,
qirar kirin ku r'ojî bigirin û ji ç'ûka h'eta mezina
k'urx li xwe kirin.

6 Gava ev deng k'ete guhê p'adşê Nînewayê,
ew ji ser t'extê xwe r'abû û çuxê li ser xwe êxist,
k'urx li xwe kir û li nava k'ozîyêda r'ûnişt. 7 Nav
Nînewayêda deng da belakirinê û got: «Anegorî
gotina p'adşê û giregira, bira meriv û h'eywan,
pez û dewar t'u tiştî te'm nekin, neç'êrin ne jî
vexwin. 8 Bira meriv û h'eywan k'urx li

xwəкьн у бькьн зарин гази Хöдан кьн. Бьра һәр
мәрьв жь р’ийа хwәйә хьраб вәгәр’ә у дәсте хwә
жь һ’әрамийе бьк’ьшинә. [9] К’и занә? Бәлки Хöдан
готьна хwә бьгöһезә у ль мә вәгәр’ә, wәки һерса
wи ль мә дайнә, кö әм öнда нәбьн».

[10] Гава Хwәде әв кьрьна wан дит, кö әw жь р’ийа
хwәйә хьраб вәгәр’ийан, Хwәде бона wе хәзәба
кö готьбу wе банийа ль сәре wан, готьна хwә гö-
һаст у әw йәк нә ани ль сәре wан.

## 4

*Бәрхwәк’әтьна Уньс у р’ә’ма Хöдан*

[1] Уньс гәләки ль бәр хwә к’әт у һерс к’әт. [2] Бәр
бь Хöдан дöа кьр у гот: «Йа Хöдан, гава әзи һе
wәлате хwәда бум, бона ве йәке мьн нә дьгот кö
тö йәки аһа йи? Ләма мьн дькьр кö әз бьр’әвийа-
ма Т’аршише. Чьмки мьн заньбу кö тö Хwәдеки
р’ә’м и у дьлшәwат и, сәбьр-ськ’ан и, р’ә’м-к’әрәм
и у жь һерск’әтьне жи зу вәдьгәр’и. [3] Ле ньһа йа
Хöдан, р’әща дькьм р’öһ’е мьн жь мьн бьстинә,
чьмки мьрьна мьн жь жийина мьн четьр ә». [4] Хö-
дан готе: «Гәло һәq ә, кö тö бона ве йәке бина
хwә һаqаси тәнг дьки?»

[5] Уньс жь бажер дәрк’әт, алийе р’оһьлата бажер
р’уньшт у ль wьр хwәр’а һ’олькәк чекьр у бьн сийа

xwekin û bikin zarîn gazî Xudan kin. Bira her
meriv ji r’îya xweye xirab veger’e û destê xwe ji
h’eramîyê bik’işîne. 9 K’î zane? Belkî Xudan goti-
na xwe biguhêze û li me veger’e, wekî hêrsa wî li
me dayne, ku em unda nebin».
10 Gava Xwedê ev kirina wan dît, ku ew ji r’îya
xweye xirab veger’îyan, Xwedê bona wê xezeba
ku gotibû wê banîya li serê wan, gotina xwe gu-
hast û ew yek ne anî li serê wan.

## 4

### *Berxwek’etina Ûnis û r’e’ma Xudan*

1 Ûnis gelekî li ber xwe k’et û hêrs k’et. 2 Ber bi
Xudan dua kir û got: «Ya Xudan, gava ezî hê we-
latê xweda bûm, bona vê yekê min ne digot ku
tu yekî aha yî? Lema min dikir ku ez bir’evîyama
T’arşîşê. Çimkî min zanibû ku tu Xwedêkî r’e’m î
û dilşewat î, sebir-sik’an î, r’e’m-k’erem î û ji
hêrsk’etinê jî zû vediger’î. 3 Lê niha ya Xudan,
r’eca dikim r’uh’ê min ji min bistîne, çimkî miri-
na min ji jîyîna min çêtir e». 4 Xudan gotê: «Gelo
heq e, ku tu bona vê yekê bîna xwe haqasî teng
dikî?»
5 Ûnis ji bajêr derk’et, alîyê r’ohilata bajêr r’û-
nişt û li wir xwer’a h’olikek çêkir û bin sîya

weда р’уньшт, кӧ дина xwə бьдə бажер к’а we чь
бьqəwьмə. [6] Һьнге Хӧдан Хwəде ə’мьри ль к’олəке
кьр, əw к’ол мина даре шин бу у ль сəр Уньс кьрə
си, кӧ wи жь we бинтəнгийе хьлаз кə. Уньс бона
we к’оле гəлəки ша бу. [7] Р’ожа дьн сьбəһе зу, Хӧ-
дан ə’мьри ль кӧрмəки кьр əw к’ола кот у əw
һ’ьшк бу. [8] Гава тə’в дəрк’əт, бь ə’мьре Хwəде,
алийе р’оһьлате баки к’əw у гəрм р’абу, тə’ве ль
сəре Уньс хьст, əw сьст бу, мьрьна xwə xwəст у
гот: «Мьрьна мьн жь жийина мьн четьр ə». [9] Һьнге
Хӧдан готə Уньс: «Гəло һəq ə, кӧ тӧ бона ве к’оле
бина xwə һаqаси тəнг дьки?» Уньс гот: «Бəле,
һəq ə кӧ əз бина xwə тəнг дькьм, һ’əта мьрьна
xwə жи əз р’ази мə». [10] Ле Хӧдан готе: «Һ’əйфа тə
we к’оле те, йа кӧ тə худан ль сəр нəр’ет у мəзьн
нəкьр, к’ижан кӧ нав шəвəкеда шин бу у шəвəке-
да жи һ’ьшк бу. [11] Ле һ’əйфа мьн чаwа жь wи ба-
жаре Нинəwайа мəзьн нəйе, кӧ нав weда сəд
бист һ’əзар мəрьви зедəтьр һəнə, кӧ дəсте ч’əп у
р’асте жь һəв дəрнахьн, ӧса жи гəлəк һ’əйwан?»

wêda r’ûnişt, ku dîna xwe bide bajêr k’a wê çi bi-
qewime. 6 Hingê Xudan Xwedê e’mirî li k’olekê
kir, ew k’ol mîna darê şîn bû û li ser Ûnis kire sî,
ku wî ji wê bîntengîyê xilaz ke. Ûnis bona wê k’o-
lê gelekî şa bû. 7 R’oja din sibehê zû, Xudan e’mirî
li kurmekî kir ew k’ola kot û ew h’işk bû. 8 Gava
te’v derk’et, bi e’mirê Xwedê, alîyê r’ohilatê bakî
k’ew û germ r’abû, te’vê li serê Ûnis xist, ew sist
bû, mirina xwe xwest û got: «Mirina min ji jîyîna
min çêtir e». 9 Hingê Xudan gote Ûnis: «Gelo heq
e, ku tu bona vê k’olê bîna xwe haqasî teng dikî?»
Ûnis got: «Belê, heq e ku ez bîna xwe teng dikim,
h’eta mirina xwe jî ez r’azî me». 10 Lê Xudan gotê:
«H’eyfa te wê k’olê tê, ya ku te xûdan li ser ner’êt
û mezin nekir, k’îjan ku nav şevekêda şîn bû û şe-
vekêda jî h’işk bû. 11 Lê h’eyfa min çawa ji wî ba-
jarê Nînewaya mezin neyê, ku nav wêda sed bîst
h’ezar merivî zêdetir hene, ku destê ç’ep û r’astê ji
hev dernaxin, usa jî gelek h’eywan?»